

Hesen îbrahim

Helo Ewropa

Kurte dîrok

Hesen îbrahim

Helo ewropa...

Kurte çîrok

Derhînana hwnerî û berg: endazyar besam ahmed

Cavdêrya capê: Bilind mihemed

jimara sipardinê (427)

capxana: Zankwya duhok

Dyarî bo /

Aram.. Ava

hêlan.. harî

helo ewropa

helo -1 -

- te çi kir?

- wek te gutî...min dû fişek gurî serê wî kirin,û tu ji qîra wî xilas kirî..

-ez bo te Mam?Lê divêt piştî taziya wî em zû karê çuna xwe bikin ...

- min hemû tişt amade kirîne. .

rê. .qaçaxçî..ü pare jî li ser te ne... !!

-ez bi pareve bo te Mam.

hêşta çilya mêrî bi dawî ne hatî,zenga telefonê lêda.

-helo ...em gehştin esîna!

helo -2-

- tu û büka ciwan li ser serê min û hedû çava hatin.

rêya me gelek başe û tenaye,hema tu keremke here ser şulê xwe.piştî çend rojekên dî,dê gehte ber destê te... !!

Di joreka bidük ü lêkday da.zava yê dinav dükêla citara xwe da fira liperdaxa wêskî didit,liberamberî wêne büka ciwan rundika dibarînit....

-helo .. çi lê hat?Derbaz nebû?

-helo ..bêhna xwe fireh bike. .hêşta ez jê têt ne bûyme !

piştî çend heîveka.zenga telefona zavay lêda ..

-helo ..ez gehiştim ewropa.... !

helo -3 -

- nêr cuda ..mê cuda..eve rêya meye..te divêt yan ne?

tu azadî!

-helo ..em gehiştin ewropa.

Karwanê mêya hêşta yê birêve.

-helo .. çi lê hatin?

-....

-helo .kengî dê dine rê?

-.....

-helo ..helo....

Kesê bersif neda!

helo -4 -

-helo..helo..xecê babu ..helo...

-helo..xecê nihu dê êt ..

-helo ..tu kî?

-helo..ez hevalê xecê me..

-helo..welat,ez xecê me...

-helo..xecê tu çewanî?

-helo..heker baştir bim,dê pê mirim!

-helo..xecê ew kî bû digel min axvtî?

-helo..welat ew hevalê min bû ..xelkê sirîlanka ye. .xwîna wî gelek ya şîrîne.

-helo ..xecê,ka birayê te?

-helo ..welat,yê gîtel hevala xwe.

-helo ..xecê ma hûn jime xerîb ne büyne?

-helo..welat, hûn kîne?

-helo..helo..xecê. .xecê.

peîwendî hate birîn.. !

helo -5 -

-erê ‘êmanet tu û jinka min,ha?

- jinka te wek jinka mine !! heta bigehte destê te.

Qunax bu qunaxê.roj bo roje.dewlet bo dewletê..

heta gehiştîne binecha wan vîyaîn.

Zenga telefona mêmê berê lêda ..

-helo..bo xwe pirsyara jineka dî bike..ez û tu jêk xilas.

-helo..helo..

Telefon hate birîn.

helo -6 -

-helo..ewropa,jinka te gehiştê esîna ..hîvîye parên me amade bikî,da jinka xwe wergirî.

-helo.. bibure, parên min ne di amadene..bila jinka min êmanetî te bit,heta paren min dirust bin.

*** * ***

-helo..bira, were jinka xwe.hema nîveka para bîne, bila nîva dî bo demekê dî bit... !!

-helo..min pare nînin..bila jinka min linik te bit.

*** * ***

-helo..were jinka xwe bibe,min çî pare nevên.

-helo..min çî jinik nînin.

-helo..helo..

peîwendî hate birîn!

helo -7-

Cih tenge..tarî ü tirse..be av ü baye..

Destê xwe,wek mirovekê kure,li wara gêra..

Cihî jinka wî,miroveke simbêl boq rûniştî bû..

pitir destê xwe gêra.destê wî kete ser sîngê jinekê. lê ew sîng
dînav dû destîn dî da bûn.

hêşta deste xwe gêra ..zanî ew jin ya bê stareye.

pitir xwe nêzîk kir..dengê guhnêlîyê,guh lê simitin.

Nevya çi denga ji xwe bînit jitirsa kuntirula bêt..

piştî ji kuntirula dawîyê xilas bûyn.

dergehê wê turmbela barî vêkirin,jinka wî xwe havêtê û pêkve
qesta telefonê kirin.

-helo ..welat em gehştin.

helo - 8 -

Turmbêl çar guşeye..ser û bin di girtîne. .ne runahî,ne ba,ne
tîjka rojê.

gelek devin ..gelek dest ü pêne..gelek çavên zilin..

Livîn nabit..kenî nabit..girî nabit!

Ne xwarin û ne nivstin..hemû man lihîvîya mirinê..

Turmbîl berev binê gemyeka gelek mezin birê ket..

çend tarî bü, tarî tir bü..çend bêhin tenig bü,pitir lê hat.. çend livîn ü bê dengî bû,kîm tir le hat..

piştî gemî gehştîe berava îtalya ..

Zenga telefona welatî lê da ..

-helo..welat, kelexên wan gehştin.

helo -9 -

-helo ..ewropa, tu bo gîru bûy?Kiçên welatî li benda tene..nekare,ne kespe,hemü yên lihîvyîa bejna te..dê were... !

-helo..welat,ez naêm,êka ciwan ü biçûk bo min digel baştirîn qaçaxçî firê kin,ez yê lihîvyîa hewe.

*** * ***

-helo..ewropa, büka te gehişt?

-helo..nexêr,ne gehişt ..

helo..helo..

Telefuna qaçaxçî hate gihurîn.

helo -10 -

-helo..ewropa, ma tu naêye me?Ma tu pirsîyara me nakî?Ma tu nabêjê min biçûkên xwe û mala xwe yên hêlayn..?Ma tu jime xerîb ne buy?

-helo..welat,ez yê bê pasportim..ez yê bê karim..ez yê bê paşerojim..ez yê bê pare me..ez yê lihîvyîa mirine.

-helo..ewropa,me pare nema pê bijîn,kes deîna digel me nakit,kes me xudan nakit..em man bê xudan..were me bibe,yan tu jî bizivre..!

-helo..welat,biburin,ne pare ye hewe pê bînim..ne şule hewe pê xudan kim..ne amade me bizivirim..!

-helo..ewropa, biçûkên te,yên buyne geruk.

-helo..welat, ez yê bûyme lawê dilê xwe.

-helo..ewropa,kiça te ya bûye bük.

-helo ..welat, ez rojê dû sê cara dibim zava.

-helo..ewropa,piştî xanî û zêra,me namûs firut..!

-helo..welat,barê min bes giran bikin,xemên min ji hêza min û şiyana min pitirin..ez neşêm berdewam bim.

-helo..ewropa..helo..helo..

-helo..welat êdî pirsyîara min nekin.

-helo..heloo...

helo - 11-

-helo..ewropa,ma tu naêy min bixazî?Ma te ci belên da bû min?ez ya li hîvyîa te.

-helo..welat(min tu nevêy,kiç mişene..ma jixune kiçên ewropa wek tene.)

-helo..ewropa,(min nehêle..evîn behire..pirî pêle..min nehêle..

*** * ***

-helo..welat ,kiçê dînê mal xirabê,heker daxwaza babê te pare ü malê dinê bin,ezê tijî berük û paxlên wî kim.. heker daxwaza babê te,zîrekî û mêranî bit, bine mala babê min mêrkuj û talan vegêrin.

heker daxwaza wî ciwanî û aqldarî bit,ew baş dizanit ka ez kîme.

Lê heker daxwaza wî paspurteka ewrupî bit.

xudê min ew pê çê nabit..

nihu ez êxsîrê kempeka birisîme...ne man min radigirit, ne zivirîn min pê çê dibit.

-helo..ewropa, xwazgînîyên min hatin.

-helo..welat, paspurta min ne hat..

-helo..ez bûme bük.

-helo ..ez bûme zava.

-helo..helo..

Telefun hatin gihurîn.

helo -12 -

-helo..ewropa.kiça min te çi kir digel zelumê xwe?

ew dilmana dinav bera heweda rabû?

-helo ..welat,dayê herkes kurê babê xweye. .

ewî kiçeka rus ya mar kirî.min kurekê yoguslavî . . em her hevalin.

-helo..ewropa,biçûkên hewe çi dikin?Li kêvane? Kê xudan dicit?

-helo..welat,dilê xwe nehêle,li vî welatê kes jibirsa namirt..!Wan jî cihek taybet heyê bo xudan kirin û jiyana wan ...!!

Biçûk berze bûn..welat hate ji bîr kirin..ziman hate gihartin..peywendî neman..telefon hatin birîn.

-helo..helo..helo..

helo -13 -

-helo..ewropa, pîroz bit pasurta te..eve ez jî hatim,tu çi dibêjî..?

-helo..welat, xwe gîru neke..lê tu erebê dizanî?Te nasnamen erbî hene?

-helo..ewropa,zanîna erebî bo çiye?

-helo ..welat,divêt tu xwe bikîye ereb..divêt tu ji devereka ereba hatibî.heker çi pasurta wernagirî.

-helo ..ewropa, piştî sed sala şoreş û xebat..piştî hizareha şehîd ü qurbanîa..piştî girtin û talan kirinê husa bi sanahî xwe bikime ereb?husa bi sanahî nifşê xwe jibîr bikim?

-helo..welat, bi serê te huye..!Te divêt were,te nevêt, rûne ser kurîya xwe... !

-helo..ewropa,bê bextî xirabe..welat biheşte..

lê kirmê ewropa gelek dijware..sed welat ü sed şoreş ü hemü xebata min,gurî paspurteka ewrupî bibin.

helo..helo..eve ez hatm.

helo -14 -

-helo..nekurê wî bû..ne,ne,biçar hizar dulara îrabû .. bibû qaçaxçî!

-helo..baş lê kir,îna ewropa û kiça wî jî revand, ..bla da kes kesê ji direw nekte kure xwe.

*** * ***

-helo..divêt hün li dadgehê amade bin,ü bo me dîyar kin,ka eve çi rüdan bû?Ka çewa dibit bira xüşka xwe marbikit?Û bo bersiva hindek pirsyaren dî.

-helo..qaçaxçî,me divêt tu me bibîye dewleteka dî.

Kevalê agirî

palêt ya didestê çepê da digiryêt,Rondikên wê ji buyaxa reş ü surin...

Didestê raste da,firçe yê har bûy.Didanên wî xwîna zer ü şîn jê dizêt...

Dîwarê girtîxanê yê dilerzit,şerim dikit,ditirsit,

Xuha reş jê dibarit..

Keval,li ser dîwarî yê nîv nîve ye.pira delal ya tîke, xabür hişke.

hêşta hemü karesat ü bîrewerî xweya nakin..

* * *

- bibure,min hindek(fener)divya.

- fener..?Digirtîxanê da fener qedexeye.

- lê min divêt,firçê xwe û destên xwe pê bişum.

"Dilê xwe digel hemü gunehên xwe û wê mirovatîya hün pê dixurin..."

* * *

Şüşa fenerê bilind bû..

Müyên leşê wî zil bûn..

Firçe kure bû..palêt bigîyan ket..keval aviz bû..

Runahîya çavên wî,bûne bizotên agirî.

**ew kevalê nîv nîve.digel leşê wî yê nazik biagirî tevav kirin û
bûne kevalek..**

Lidadgeha nürinbêrg hate pêşandan.

2002-8-12 nürnbêrg

Nazê

Xudê xirab kir mala babê min û ya gundîya.

Min sund xwar bû bi serê te û befira çîya

Kes ne ramusit serê memka û hinarukên rüya

van dujmin ü kevne perist û paşmaîya

Ne hêlan tu biramusî memka ü bigehîye hîvîya..

**Devê wî biçükî,bibişkujka memkê xwe vena.wek her car,layê
layê bo digut..**

**çend carekê zêrevanên ejdehay di ên û kiçên sinêla jê digirin ü
dibin.**

**- me kiç divên,kiçên sinêla û biçük,kiç xwe diyar kin..ka kiç..ha
ha ha..**

Nazê her car biçükê wê jina sere jê distand û sêngê xwe yê çarde biharî dikire didevê wî biçükî da.da kes nizanit ku hêşta kiçe.

Lê,bişkujkên memka..hêkên kewa..hêlîna bilbilê küvî ...şitla nêrgizê..dêmê befirîn.

ew zêrevanê enî girê û lêv doqçik.şêt kir..

Nazê dizanî,hesu na gehte Mirada..

Hesu,serê xwe jinav wan pîremêra ra bilind dikir. çavên wî bi sîngê nazê ket.

herê nazê, bê bextê hîle bazê

Li wan jivana, li wan xilweîya

Li min Mirad bû dîtina cut memka û

vekirina wan kezîya.

*** * ***

- nazê..nazê..

- keremike,hesu..bixwaze,serê min biqurbanu..

- nazê..min hîvî ü daxwazîyeka hey.

- hesu..dilê min berî canê min gurî te bin.keremke bixwaze.

- nazê..hemü dizanin tu ya hesuy ü hesu yê teye.

-erê, bêje hesu te ez şêt kirm.

- nazê..ez ketim bextê xudê û yê teda,tu serê memkên xwe nîşa çavên min bidî hêşta ez ne mirîm.

- hesu..ez bextê teme,tu vê daxwazê jimin nekî. . bişkujkên memkên min,dîyarîya şeva zavanîya tene.

* * *

Destekê reş û deqday,milê nazê girt û biçûk jiber sîngê wê havête der û wek gula hêrûyê da ber sîngê xwe û gutê:

-heker te hevt mal û mêr kirbin,ez dê bime yê heştê.

Wê kire hewar..

Hesu kire hewar..

jinka..biçûka..pîremêra..stêra..heîvê..rojê..dul ü kanî ü çîya...

guhên zavayê nü ne simitî bûn..

Xwîna bûkanîya wê.digel ya hesu têkel bûn..

Qêrîya kiçînîya wê...gelek jikêmîya barana helebce dijiwar tir bû...gelek jiqêryên enfal kirîya bilind tir bûn.. digehşte guhên hemü mirovên hest mirov..

lê di çi guhada denig ve nedida ü kes ne diçu pîrozbahîya bûkanîya wê.

her xîzê şarîyay leşê wê disot,her agirê bê xudanyê dilê wê disot ü her fîstevala xwînê dijiwar dibû..

hemü pêkve bûne kevalê hunermendekê şareza..

**Keval,jipiştê ve ewrên tarî bûn..!lirexa didanên
daynesora..jinavda,agirê sor ü kes bû..**

Birüsîya mejî dihêran..barana xwînê..jehrê dibarî.

Cihê fîstevalê "selamyê" bû..goristan ne dîyare.

19/4/2001 nürnbêrg

Hîvîyên hlawîstî

Dîyarîya min bo gîyanê (hewar)yê xwe Gurî xerîbiyê kirî..

Dîyarîya(hewar)bu perlemanê nerwîc + ewropa..

Li ser wê masa li nîva jora biçûk,wênê babê wî yê danay bû.

**Li rexê rastê,wênê dayka wî digel xûşik ü bira..li rexê çepê,yê
jara wî,wek dadiwera di rapêday bûn.**

**Dawedarên wî.nexşa Kurdistanê,wênê pira delal, ü çîyayê gare
bûn.**

**Dîdevan.pertuka hozanên evînyê,hindek kaxez ji rojanên wî
bûn.**

Bîner.mejî û wijdan ü dîwarên bê dil bûn..

Dadgeh ya likare.

Bab: Te bu çi welatê xwe hêla?

gunehbar:bikenîyeka sivik ü livîneka şêtane.

- jiroja êkê ez hatîme vî welatî ev pirsîyare jimin hate kirin.

**polîsan..dadweran..karmendan..welatîyan.. darubarên vî welatî
..**

her eve pirsîyara wan ya êkê ye. .

**ger te gute êkî dem çende?Dê bête te, bu çi te welatê xwe
hêlaye?ger te gute kiçekê,ka ramusanekê.dê bête te,bu te
welatê xwe hêlaye?**

hün hemü baş dizanin ka min bu welatê xwe hêlaye?

**Dayk:Min çend cara gute te,daykên xelkî bu mirovî nabin
dayk..welatên xelkî bu mirovî nabin welat..**

Kenîyeka nazik jidadwera rexê çepê hat:

-yarên xelkî bu mirovî nabin yar.

jor hemü bû fistevala kenyê..

**Gunehbar:Raste,raste.ez van hemüya baş dizanim. min çi car
xwe jiwelat û mirovên xwe nekiryê.. !**

Kaxezên bîrhatina destê xwe bilind kir,divîya biaxvin..

Dadwerî nivê destûra axivtinê daye.

**Kaxezîên bîrhatina:Tu mirovekê bê dilî.te welatê xwe, kes ü
kar,heval ü birader.hemü hêlan û lixweşîya dilê xwe gerîyay .te
li ber perên min ya nivêsi..**

**ev welate parçeke jibiheştê,ciwanîya kiçên wê,ciwanîya baxçên
wê,tenahî û yeksanîyê. Kurdistan jibîra min bir. yar
nema,zivirîn bû xewin..**

pertuka hozana rabü ser biya û kire hewar:

**- direwe..ev tiştê te gotî çi rastî ji bu nîne.ez baş ja dilê wî
dizanim.guhê xwe biden vê rastyê,vê hozanê:**

ew welatê bûye çar

Dinîya hemü bû neyar

Min hêlan û ez hatim

Dayk ü babên pir hejar

êş ü elem lê dîyar

Min hêlan ü ez hatim

ev xweşyên hu dîyar

Tenahî ü yasa serkar

Min ne vêtin dê hêlim

Ciwanî ü pare ü kar

Şevên kes ü sur ü yar

Min nevêtin dê hêlim...

hola dadgehê tijî kenî bû,gelek denga pêkve gutin: Pa bu çi naçî?kê rêya te girtye?Li van kulana çi dikî?

- çav lê kirin!gerîyan li jiyaneke baştir,jikevlujankê xwe derketin,gihurîn,cîhan dîtin..hindek egerên dî jî.

ez bixwe jî nizanim ka çine.ewan hemüya ez paldayme ku bêm û bimînim..!!

Lê piştî paspurta min jimin wergirtîn,piştî direw li min kirîn.Wekû direw ligelê min jî kirîn,piştî ez kirîm êxsîrê dest bi qeîd û zincîr.tine mafîe xwarinê daye min..ez bê hîvî bûm,min çi nema xebatê bu bikim..tinê rêya ez xwe jivê girtîxana kirêt rizgar bikim..

berevanîye,lê min bervanî pê çê nabit!

Bab:Were bizivire,harî min barê giran helgire..

Dayk: çavên min birêya teve tarî bûn..

yar:Xwazgînyên min her yên zêde dibin.Rüyên min yên nazik yên di çirmsin.

Nexşa Kurdistanê:ez tinê nexşe ü navim,ne min çîya man,ne min mêrg ü kanî.ez ya bûyme pawane bîyanîya.

pira delal:Tîkên min her yên fireh dibin,av nema ez sîberê lê bikim.

ew kursîka libin pen wî livî.dengê hemüya hate gihurîn.

**Wênê babê wî ket.Daykê şüşa wênê xwe digel perwazî
şikand..hewara wê.digel hewara yarê,têkel bûn.**

Kursîkê xwe jibin pîya havête der ..

ew leşê nazik hêla bi parçeka bendikî ve hlawîstî û bê xudan ..

Rengê pira delal nema li pêş çava.

**Dengê babê,dayê,yarê,ava xabürî...nehatine guha..befir ji
çîyayê gare sil bû..**

**Digel çeküçê dadiwerê nîvê.dadgeh bi dawî hat.bêy çî birîyar
bêne dan ..**

**Leşê wî li nîva ewropa, bibanê joreka biçük ve wek gelek
birîyar ü peîmana ma hlawîstî!**

25 - 8 - 2001 nürnbêrg

Cîhangerî

**Heft efrît,yê tevnekî di raçînin.her daveka wî tevnî ·hizar ta jê
diçin.her tayekî,hizar telhe di êne vedan.hizar bîr di êne
kulan,hizar paryên jehir kirî di êne dauran.**

Tevnê vê carê,ji dijarîya davên wê,ji aluzîya tayên wê,ji kerb ü kîna efrîta..

cîhan kire marekê êk ser.Kürîya wî ya di paxla hemü hejaran da.didanên wî yên digerdena hemü şureşgêran ra.gehên wî,av ya kirîye ger û nube.nan yê birandî.

Tilîyên azadîyê,dest qutana dîmukrasyê.aştî ya sil kirî.

Bazar kirine êk,kargeh,tenig kirin.cîyawazîya çîneyetî fireh kirin..

Bînerên vê şanoyê.dest di qutan,ji bo pêşketina şureşa pêzanînîyê .

2-2- 2001 nürnbêrg

Hêstira şembuz

Li demê ez yê genc,ez yê li ser xwe.ez xudan welatekî bindest.

Barê hêstira min,her dem tup ü cebilxane bûn..!

li şev ü roja,li Gerim û serma,li tirs û birisa,li nehal û çîya.min hizar şivtan li tenştên hêstira xwe didan,û her ez li berahîya wê diçûm.

ez gelek ji wê şembuz tir bûm.

- dê birêve here heî mîrat,nê milletek yê lihîvîya karê te. dê husa şoreşê birêve bî?Dê husa min kîye serleşker!

her şivtan li tenştên wê dibarîn,her hîvîyên min mezin dibûn,nîzêk dibûn.heta bûyne rastî.

evro ez yê bûyme hêstir.

hêstireka pîr ü lexe,ne şoreşe xudanê min xebatê bü bikit.ne serleşkerîye pê bixurit.Ne hîvîyên milletanin.

Karxaneka bê dile·hustayekê şareza.karekê rojane û giran..

Ne bi şivtana û ne bi lê xorînê,ez neşêm hevrikîya vî amîrey bikim.

Şeq şeqa pêlên şulî·ew tenga bê dawî,her şulî di kêşte ber sîngê min,qet na wastit.

- dê hêdî,dê raweste!Ma tu na wastî?Ma tu na şkêy?Ma tu têr nabî?Ma tu nizanî ez yê pîr bûym?ez yê nesaxim? ez ne zelamê hevrikyê me?

eve ye xweşîya min welat bü hêlay?eve ye dawîya xebat û mandîbûna min?

ew hêza bê dawî ya vî amîrey.

Dengê hustay.xewa digel min may .

Birînên şoreşê, kul ü xemên xerîbyê.

ez kirim mêvanê guristane...

6-2-2001 nürinbêrg

haîd park

Dengê wî,guha disimit,gutinên wî,mejîya aviz dikit. hizirên wî dila didizin.

-heta kengî?heta kengî dê mirovê reş,ête tepeser kirin?

heta kengî dê cîyawazîya nejadî mînit?heta kengî dê xudabendî hebit?heta kengî?

Dengê ewê birex ve·hzirên min kêşan..

- bese bindestî.bese maf xwarin.Bese kuştina bê gunehan..

Divêt cîhan hemü azad û serbest bijît ..

Divêt kes ne mînit bin dest.. , ...

ewê li rexê dî. çend kesa yê kirîye dinav xweda û ji dengê wî pêve çî dîyar nakit:

- xudê,bü hemüyane.Xudê,xudanê erd û esmana ye. hemü tişt û gîyandar bi fermana wî livîn û kar dikin. lewra divêt em çî car ji bin alayê wî dernekevin.

Divêt em rêya wî bernedin.

û îslam,baştirîn rêye bu razî kirina xudê...

Qeşeyekî birex wî rîh dirêjî ve,destê xwe li ser singê xwe xaç dikir.

navê babê,navê kurî,gîyanê pîroz..amîn.

- tenahî,aramî,yeksanî.her ji navên kurê xudê ne...

ewe dinîya hemü kirye baxçekê xuşyê û tenahyê.

divet em rêya wêrsê xudê û kurê xudê bernedin, eve jî wek di kitêba pîrozda hatî.....

Wî haxamê rîh dirêj.wek kimkma serê xwe di hejand û bizimanê ibirî hindek ayat ji tewratê di xwandin û rêya urşelîm bi rêya beheştê ve di girêdida ü dawa axa (al-mîad) kir....

ew kur tulazê li ser milên hevalên xwe.dengê wî yê şêlî bûy.tilên wî wek(vikturiya)di bilind bûn û digut:

- felestîn erebîye,qudis erebîye.bigîyan û bixwîn em fîdakarî.

ewê dî bizimanekê,min çi car guh lê nebûy,şoreşa xwe dikir.

iha li vêre bû..cara êkê dengê jina bilind buy.dawa mafê xwe kirîn.

iha li vêre bû,hizar cara pala berxwedaye.ala bilind kirîne..

her li vere bû,wî kiça sinêle ya di kuşa yarê xwe da guhnêlyê dikit.

her li vêre bû,zikên birsî belgên dara di cwîn..

her li vêre bû,mirov hest bi mirovatîya xwe dikit ü car jî jê bê hîvî dibit.

her li vêre,di bite fîstevala dîmukrasiye,azadiyê, aştiyê.

car jî dibite cihê pêkenîn ü lêbukan..

ew park bibû(muzaîyk)hemü reng,hemü deng,hemü aydulujî

bîrcewazîya berevanî ji xwe dikirin.pirulîtarîya ala bilind dikirin.Nasywnalîzma..cuda xwaza..maf nasa.

maf perwerên gîyaneweran.partîya kesik,partîya sor,partîya reş... , ...

Tinê dengê dayka min ne dihate guhên min... !

6-3-2001 nürnbêrg

Nêrgiza çiyayê küvî

hizra vê çîrokê kevne ... lê rüdan rojane ne..

- nêrgiz..nêrgiz...

- belê,beîbün..were, texêre?

- nêrgiz, çîya silav yên li te kirîn.divêt evro jivanek digel te hebit.Li zevya nêrgiza.

- de bila,nê ez sotim bu dîtina wî.

Destê beîbüna biçûk girt,wek her car û beref zevîya nêrgiza cûn..diberra stiran ü hozan bü di gutin..

Were lawiku evro jivane

Were çîyaw evro mêvane

Were bi çerîne kuz û pawane

Sîngê min bo te deşt û zuzane

Lêvên min ava kanîya çîya ne

Bejna min wekü hewda gulane

Were lawku li me jivane

Were çîyaw li min be xudane

Were talan ke sîng û lêva ne

Dengê wî amîrê kirêt,ewe ji stêreka dür hatî.stirana nêrgzê û kenya beîbüne sotin!

Amîr,wek hirçeka çîyay kete beramberî rêya wan.

herdû hşik bûn,neliv man!

Siwarbûyên wî amîrey peya bûn .bêhna byabanî ji leşê wan dihat.

pestalên wan xîz jê dibarî!

**her nêgiz di lerizî.her siwarên amîrey di kenîn.beîbûn
ditirya.ew dikenîn!**

Li ser leşê nêgizê bü ger û nube.

Beîbûn di girya!

Nêgiz hşik bû..beîbûn sor dibû!

**Siwarekî bêhin teng,qelûna xwe li ser sîngê beîbûna heft salî
kêşa.**

Bi serketin û bi cih înana wî erkê ji bu hatîn ..

**pêkve siwarî amîreyê xwe bûn û bi dest qutan û kenîve berev
asmana bilind bûn.**

**çîya,li jivanê xwe hat,didestê rastê birnoyeka têda.. didestê
çesê qefteka nêgiza ne.**

**Birino dana ser milê xwe...qefta nêgiza havête ser wê keluta
bera.**

Kêlîyek bo wê keluta bidük dirust kir.

Berê xwe da asmana,cihê amîr bilind bûyê.

hîştta nêgiz li wê zevyê şîn ne bûyne.

hîştta birinoya çîyay·ya li ser milî.

1-4-2001 nürnbêrg

Fanusa fatê

Dîyarî bu wê zaruya nihu buye pîrejin..û hêşta fanusa xwe parastî wekû şoreşa xwe parastî...

nihu jî welatê xwe di parezit...

Destê xwe yê biçûk,li fanusê da û di gel gundya berf şkeftê revîn.

Li pişt xwe zivirî.gund yê bûye bizotekî agirî.

Agirê fanusa wê şiya wan ji serma û hirç ü huva li nav wî zinarê tarî biparêzit.

Fanusa fatê,digel fanusa şureşê hil dibû..

Li nav wê çadirgeha sîmkirî.runahya wê pelatînik di kêşane xwe ...

li revê rê kurt di kirin..!

li şerî.agirê şoreşê zêde dikir.

Li xerîbya bêhna welatî jê di hat.

li zivirînê.bibû heval.

Li serhldanê,bibû bizotekî gerim û sîngê dujmna disot.

Li serketinê bibû xelat.

Nihu jî bi hemê hêz û runahya xwe.fatê ji durpêça aburî di parêzît û rê bo çavên wê yên tarî run dikit...

11-4-2001 nürnbêrg

Ji helebçe...bo xezze

Dîyarîya mihemed omerê xawer,bo mihemed dirre..

Duhî bû,min û birayê xwe li kulanên helebçe,digel kewê xwe yarî dikirin..

Duhî bû,digel dayka xwe û heşt xûşka,nêrgiz ji deşta şarezurê di çinîn..

Duhî bû,me agirê nezirozê digel hevala li serê çiyayê hindirîn hel dikir.

Duhî bû,kelexê Mamê min,li felestînê may,hêşta tilên wî wek(vokturîya)yê di bilind bûn..

her duhî bû,Mamê te,barana xerdel û sîyanîdê libajêrkê me barandî.

her duhî bû,xelkê bajêrkê me bê gîyan hêlayn.

her duhî bû,kewê min ji qebînê bê bar may.

**her duhî bû,pişta babê min neşîyay min ji tuza xerdel ü
sîyanîdê biparêzit.ez ü ew,bûne peîker.**

Lewra evro,li bajêrkê te xezze,Mamê min di tana te nehat..

**lewra evro li bajêrkê te xezze,wan berên biçûk.wek destê
te.neşên wan tup ü tanka rawestînin.**

**Lewra evro,pişta babê te.neşîya leşê te ye biçûk ji gulên
dagîrkera biparêzin.**

Lewra evro,tu jî bûye hevalê min..

**lewra evro,min birîyar da dîsan kêlya xwe ya biçûk, bi kime
berên biçûk û bü te bi kime dîyarî.**

Tu jê çeçekê zeîtunê bü min bike dîyarî. .

em dê mînine li hîvîya selahedîn.

2 .1- 2001 nürnbêrg

Zarokên tirafîklayêta

gilup,sor bû.dû dû,sê sê ye,xwe ji ser lêva cadê havêtine di pencera wan tirumbêlên rawestîyay da..

- cigare heşt dînar ...sê moz pênc dînar.

Digel kesk bûna gilupê.wek mişkên ji ber kitikê direvin.carekadî ber bi lêva cadê revîn..

Lê wê tirumbêla bêhna sipîrtuyê jê dihat û digel bêhna dularî tekel bûy. çî pûte bi sor û zer ü keskatîya wan gilupa nekir.

wek kevalekê şîwekarî,cigare ü moz ü tuvîk.digel xwîna wan têkel kirin.Da bibine kevalekê rengîn dimozexana mirovayetyê da.

2000 -6 - 23 Sê mêl

Sê kelutkên bera

-1 -

Li wê şîva birex wî kavle gundê şîwarên wî xweya.

ew kelutka bera min veda.kelexê tulazekê nîv mêre. hêšta birînên wî dizan ..

Di paxla wî da wênê dezgira wî û hindek hozanên dijiwar.hêšta di sax bûn.

-2 -

ew kelutka ji wê wêve.kelexê kiçeka tulaz ü nîv jin.

hêšta lêvên wê bi kenî bûn.hêšta benduşkên paxla we ne hatbûn vekirin.çi xwîn bi pêsîra wêve nebû.

-3-

Berî kelutka siyê vedim,rastîya wê jî bizanim..

Qulnca min gerim bû.çavên min tarî bûn û bûme xudanê kelutka siyê.

22 -6 - 2000 Seîrangeha maltayê

Enmuvêk

-1-

Revda landgiroza,wek bayê birüsîyê,beref wê bîyabana berfireh dane rê...

Li düf sêra wan amîreyên gelek pêşketî.ew bîyaban hemü pîvan.

çi muşek ü çekên kumkuj ne dîtin.

çi xerdel ü sîyanîd ne dîtin.

Tinë hindek şitlên nêrgiza,hêşta di geş bûn.

piştî ew xîzê şarîyay.vedayn,çend hizar kelexên rizî bûn.hîşta nêrgiz didestên hindek tulaza da di sax bûn.

Li zivirînê.birîyar dan.çi çekên kumkujyê ne dîtin!

- 2 -

Kun û qulaçên wê girtîxana mezin hemü serubin kirin.

kiluxên mirova vedan..ew leşên rizî hildan..ew gerdenên bi sêdarave.dû sê carî li dur zivirîn.. zîndanên tarî run kirin..libin pên wan dengê hestîya guh di simtin nalîna girtîya,dil di sotin.birsîya leşê xwe di xwarin.. qemçîvana xwîn fir.dikirin.

piştî zivirîn.birîyar dan,çi çekên kumkujyê ne dîtin.

- 3-

Li we nexoşxana mezin,birînên rizî vedan.Berükên dixturan seh kirin.duşeken ji kîrim ü qirêjê,renge xwe guhartîn vedan.

Biçûkên ji birsa mirîn..pîrên ji tîrsa mirîn..tulazên ji bê derman mirîn..dxturên ji şerma mirîn ..

kêşan dadgehê.

Dermanxane divalane..berçêlik divalane..dil ji xwînê valaye..

Birîyar dan,nexoşxane ji çekên kumkujyê valaye!

-4 -

hizar şivtan li tenştên landgirozên xwe dan.

Bihust bihust welat pîvan.

ew mizgevtên tijî mirovên mirî...ew dêrên tijî mirovên ji tirsaxwe xaç kirîn.

Wan meîxanên mirov jibê karyê kirîn.wan kargehên pale ji bîr kirîn..wan çem û bîstanên şînkatî jê hatye dizîn..wan cadên şün pên hêştira kavl kirîn.

Li dawyê û piştî pênc hizar kavle gund seh kirîn.

piştî şupa dûsed hizar berze bûya,berze kirîn..

liser kavlên helebçe rawestîyan.û birîyar dan.

çi çekên kumkujyê nedîtin!

-5 -

Giropa wan li nav guristaneka tevaîy,li bîyabaneka berfireh rawestîya...

- silav..hün li çi digerin?

- bibure,me tu ji xew hişîyar kirî.em yên li çekên kumkujyê digerin.lê wesa dîyare ji vê guristanê.çi çek nînin!

- ji ber çi hün li van çeka digerin?

- me divêt van çeka ji nav bibin ..

ji ber ku me hindekên nütir û kujektir dirust kirîne.

**pitir ji dûsed hizar kelexa pêkve bü wan dest qutan û bû
şehîyan...**

Li zivrînê birîyar dan, çi çek li vî welatî nînin!

30-1-2003 nürinbêrg

Bexda ket

- 1 -

harun elreşîd,yê nemêre....

hizar huryên rwîs yên melevanîya dibirka şerabê da dikin.

bük ji zava dizîn..

tulaz xesandin.

mejyê zana digel tiryakê muxil kirin .

hejar mirin.maqûl ü dewlemenda bu nanekê xwe ji çek kirin.

hêşta harun elreşîd yê bay li pêşîra xwe dikit.

- 2 -

Bexda ket..peîkerê reş bi dest qutanê ket..

gelek ji birsa ketin..gelek ji tirsê ketin..gelek ji keîfa ketin..

**lê hîvîya birêve..ew belêna bi ristêve..ew dawîya bi nexşêve..ne
ket.**

- 3 -

**Bexda ket..nexuşxane ketin..girtîxane ketin..
pertukxane,mozexane,şano,kargeh ketin.**

gelek sivîl,gelek birsî,gelek hejar bûne qurban û ketin.

Xudanên nü,ala xwe li ser bîrên gazê çikilandin û nehêlan bi kevin.

-4 -

**Bexda ket..stem ket,sêdare ketin,dîwarên cudahyê
ketin,tuxîbên hizira ketin..**

gurepana xebatê tijî siwyarên neşareza bûn.

Tirsa mezin..

erê heta kengî dê bezin û nakevin...?

- 5-

Bexda ket..sîbera(teîrul ebabîl)li bexda ket ..

ter û hişk bûne xwelî ..kun mişik li rostemê zal bûn qeserî..

leşkerê mîrî bûne tiwîrî..

mêrxas bûne(nexas).

Kun mar bûne kuçik ü telar.

mîrê mezin xwe kire mişik.

2-8-2003 nürnberg

Sîbera xebatê

Serê xwe yê werimî,dana ser wê masa ji pîsatyê û kevnatîya sala, rengê xwe guhartî.

çend carekê deng ji gewrîya êk ji wan rüniştîya di êt.

yan dengê lêkdana dû şüşa di êt ..

serê xwe bilind di kit û berê xwe didite cihê deng jê hatî.

Car jî wê dükêla citara.ewa bibanê wê meixana wek şkefta ve bûye ewir.bi hemü hêza xwe di hilkêşte gewrîya xwe.

Car jî wan şüşên vala serubin dikit û hindek çipka jê berdidite gewrîya xwe û carekadî dizivrtte cihê xwe ü rüniştina xwe.

- Mamusta..mamusta..

- belê..te xêre?

-hlu, vî cihî vala bike..eve hindek mêvan hatin.

- bila keremkin..cihê wan jî heye.

- ne. .ne..tu kerem bike derkeve.Da em bizanin şul bikin.

- dê kîve çim?ez jî wek wan mirovim!

- lê ew wek te ne qerdarên mene..

heta tu wan parên li ser xwe nedî.tu firê lê nadî.

- wesa dîyare,tu min nanîyasî?

Ma tu nizanî,gelekên wek te li hîvyê bûn cantikê min
hegirin...?Û geleka jî hîvî bû tivenga min rakin? hewe hemüya
Mirad bû li dîwana min rûnin.

-ew dihî bû ..slav li evro ye.

- lê her ez ew mirovim ..her ez ew şêrim....

Tinê,tinê ‘ya ji min kêm çend filsekin..u..u..u..u..

-iha me ew çend fils û ew u, u, u divên ..ma dê çi li te kin.. ?

31-1-2003 nürnberg

Giwantanamu

-1 -

ehedun ehed,ehedun ehed... , ...

Bilal alhebeşî yê li ser piştê.kefrekê mezin yê li ser sîngê wî.

her çendekê (umeye)yê didite ber şivtan û qamçîya ü dibêjt:

- navê (hobel) bîne..navê (allat ü alizze) bîne.

Xebera bêje (mihemed)..bizivre ser dînê me...

her ew tinê dibêjit:

-ehedun ehed. ..

heta ez ji wêrê hatîm,hêştta di wî halî da bû..

Ne(ebu bekir) hêştirek firot û ew pê kirî..

ne wî dînê xwe guhart ...

ma diwî seruberî da.

- 2 -

- navê te?

- Seîfualle..

- jiyê te?

- Deh sal..

- Tu çi rêxistinî?

- Rêxistin çiyê?

- Tu digel kêy?

- digel xudê.

- Lê xudê dijî mirov kuştinê ye.
- hün ne mirovin.
- Mirov bi dîtina te di çewanin?
- her kesê li ser dînê me ne bit.ew ne mirove,û kuştina wî fere li ser me.
- Kî ev gutine nîşa te dayine?
- bab û kalên me..
- Lê xudê gutîye,mirov hemü wek êkin li ser erdî.
- Le em dibêjin,hün ne mirovin.
- 3 -
- Te çi karên xirab kirîne?
- çi ne.
- Te çend kes kuştîne?
- Kes ne.
- Te çi kirye ‘heta tu girtî?
- çi ne..
- ji ber çi tu li vêrey?
- ez jî nizanim.

- Tu çewa girtî?Tu digel kê bûy?

- ez digel kesê ne bûm. ez li ber mirîşkên xwe bûm demê ez tîrgîm!

- Te şerê çekdaryê kirîye?

- Dijî hewe. . ne.harî hewe erê.

- eve gelekên wek te min dîtin.ez nizanim bu çi înayne vêre?ji berçî girtîne..?guneha wan çîye?

- ez jî wê pirsîyarê dikim!

- 4 -

Dikenî..dgirîya.. sor dibû..reş dibû.

Careka dî di xirîkêna xwe da di hal didû.

Wek meymûnkeka har,di rikeheka sîmkirî da yê qeyddar bû.her livîneka wî,deng ji hizar amîret û zincîra di îna.

Serê wî hilkeşa bû dinav güyekê reş da.

Xwarin ü vexwarina wî bi şîrînqa ye.

Bersiva çî pirsîyara nadit.

Kes navê wî yê dirust nizanit.

Kes navê welatê wî nizanit.

Tinê hemü dizanin ku tîruriste!

- 5 -

Ne ji nivêja têr dibit,ne ji xwandina quranê.

Destên wî ji bin zikê esmanî ve nabin.

Xwarina wî dua ne.vexwarina wî yasînin.

çi hizira nakit,ji bilî hizira xudê.

çi şola nakit,ji bilî peristina xudê.

çi rêya nizanit, ji blî rêya şehyid bûnê.

ew rikeha nihi têda dijît.yê ji gelek tişta bê bar kirî.

Neşêt cîhadê bikit.

Neşêt deiwê belav bikit.

Semta berê reş jibîr kirye..

Zêrevanên wî çi ezmana nizanin.wek (rubuta) karê xwe dikin.

hemü yên li hîvîya birîyarekê..birîyar gîru bû..

Şer har bû..

girtî hatin ji bîr kirin.

- 6 -

çend bihusteka ji berava filorîda wêve..

çend bihusteka ji lîsê azadyê wêve..

çend bihusteka ji hêlîna dîmukrasyê wêve..

Li wî cihê kiç kiçî mardkit,û kur kurî..

Li wî cihê dadiweryê pişkên xwe dayn..li wî cihê bûye meşxelê cîhangeryê...

Li wî cihê leşên rwîs,wek marên evîndar li berçavên rozê guhnêlyê dikin..

li wî cihê bazirganyê rolek serekî hey..

çend bihusteka ji wêrê û wêve..

giwantanamu ya ji ferhenga mirovayetyê derketî.

Ter.ü hişk pêkve agirê cudahîyê boş dikin..

Xudan şîyan bûne mirov..

hejar her man hov!

- 7 -

Teraziya dadiwerîya evro.bendikên wê di sistin.

wek megnatîzî her layê asinî digirit.

gelek cara dadiwerî bi binê esmanî ve dimînit..hovî xwe li ser erdî pan dikit..

binavê dadiweryê.gelek cara dadiwerî şehîd dibit ü bihayê şehîd bûna wê pîvazeke.

Binavê dadiweryê xwe kirine wêrsên xudê li ser erdî..

binavê xudê sera dibirin ..jina dikine sebaya..malê wan bü xelîfey di hinêrine paytextî!

- 8 -

Rîhên wî yên dirêj digel qeîdên dest ü pêya têkel bûyne.wek daralînkê hatye rapêçan.tinê dû çavên zil xweya di kin..lêvên wî çi şînwar nînin.dengê wî ji kûratîya dilî wî di êt ..

- Bimirt emirîka..bimirt îsraiyl ..xwedê mezine..xwedê mezine..

Dengê kumputerî mejyê wî di hêra.

her pirsîyar zêde dibûn,her dengê kumputerî har dibû. her mejyê wî run dibû.

Lêvên wî wek şêrekê har,dinav dehlekê boş ra maye asê,xwe di xwarin.ayat li düv ayatê.yasîn li düv yasîne. giraniya wan rîha di şeqand û guhên xudanê kumputerî tijî dikirin.

- xudê mezine,xudê mezine.

Ne xudanê kumputerî karê xwe hêla,û ne wî yasîn ü duayên xwe hêlan .

her rîhên wî dirêj dibin.her qeydên wî zêde dibin.

- 9 -

Bazara mirovan..

mirovê ser demê kumputerî.bihayê wî milyonin..

mirovê serdemê nü,bihayê wî çend hizarekin..

mirovê serdemê berê ,bihayê wî çend sedekin..

mirovê nîyandirtal,bihayê wî çend filsekin.

Mirovê rojhelat, çi biha nîne!

-10 -

**Dengê kenîya kiçan,stiranên gencan,mezîqa azadyê, deholâ
dîmukrasyê,bêhna maldaryê..**

zîndana wî tijî kirbûn.hizra gund û çîayên welatê xwe dikir.

Mirov,mirova dixun.

hejarî,dêwekê zale.

Birs û nexoşî,dû birane.

**Xwandin û zanîn mezintirîn dujminin. çek û tirîyak li hemû
malane.**

Dadiwerî peîveka girane.

her kesê kîluyeka tirîyakê firot,da bi kilaşînkufeka rosî.

jin meymûnkeka girête..

Nivistin nîne,şul şerme,avedanî xewne,nan sîtafke.

guhên hemüya dibelin li hîvîya fetwa yekê

fetwa tinê cîhade!

4/4/2 .. 4 nürnbêrg

pirça wê

Dîyarî bo xudana wê pirça ez kirîm sufî

Ez neşêm çî cara xwe li beramberî çavên wê bigirm.

Livîna lêvên wê, wek distarî min di hêrin.

Bejna wê, min di êxte dizivirokeka harda..

Sîngê wê, wek sîlavê min digel xwe dibit..

Dest ü tlên wê, wek daralînkê min bi xwe ve girê didit..

axvtinên wê, min dikine sufîyekî dîndar û dihal diçim.

Dibit ez bişêm caran xwe rabigirim li beramberî harîya kenîya wê..

dibit ez bişîm xwe rabgirim beramberî tîrên awirên wê..

Wek birîndarekî birîn kür.ji mêyatya rêveçuna wê dibite nalîna min.

Lê çî cara ez neşayme û ez neşêm.beramberî pêlên pirça wê,xwe rabigirim!

5/4/2 004 nürnbêrg

Kelha nizarkê

Wenetgir yê şarezaye.çavê kamîrê ji wan kun û qulaça venabit..

Derhêner gelek zîreke.her wekû jîyana xwe di vî cihî ve burandî.

Bi rengê hunerî,şînwarên wan kevalên bi guştî ü xwînê hatîn nexşandin,dîyar dikit..

— iha li vêre bû..erê. .erê ·iha li vî cihî bû.

— eve hêşta xwîna wîye bi van dîwarave..eve mejiyê wîye...

— iha li vêre bû..babê min daye ber bilok ü kevira.

Dû çavên zil û tirsîyay.tila xwe dirêj kire wî cihê hizar cara dayka wî bo vegêray. .

Û nihu ew cih.kuçik û dîwana wanin!

Wînegirî divya wê gurepana di nîva kelhê da wêne bikit.

ew cihê ne jimêje,hemü lê kumkirîn ..

nêr û mê cuda kirîn.

Nêr hind bi kefira kuştin ü hind berzekirin..

Mê li pêş çavên cîhanê kirêt kirin..

Nihu,ew gurepan,ya bûye yarîgeha biçûk bu nevyên wan.

- em hemü li vêre kumkirin,û yên nêr birin ü nezivirîn .

Biçûk hind ji birsa mirin ü hind ji nexoşî û tirsas ..

Bêhina enfala reş hêştas tijî hemü kun û qulaçaye..

hejarî mêvanê hemü malaye.

hîvîyên wê pîrejina bi çaven xwe.mejîyê kurê xwe dîtî.û yên wê jina mêrê wê ser lê birî.wî biçûkê xüşkas wî li pêş çava kirêt kirî.

hîvî har bûn,umêd sax bûn,bihayê wan qurbanîya hate berî.

Lê destê biçûkên wan na gehte hemü deqas.da fêqîyê xebatas bab û birayên xwe bixwen.

lewra hîvîyên çinarê di dijiwar bûn..

— Min divîya bibime Mamustayeka biçûkên pula êkê .

Min divîya xwandin û nivêsinê fîrbibim..

Rast rabû ser piyas bi dîwarê kelhê ve,û beref esmanas firî...

Biçûkên jî wan hestîya û wê xwînas bi dîwara ve bûyn. wek pelatînkas lidûr wênegirî kum bibûn..

Divîyan dengê xwe bi gehînine hemü cîhanê,lê hindî dilê wan yê mezin bû,hindî xwînas wan yas har bû, hemüyas pêkve hizar cara gutin, bijî Kurdistan ..bijî Kurdistan...

Ne westîyan û berdewam bûn.

**pirugiram bi gutina eîreqîb û navê derhênerî bidawî hat.
lê hîvî pîremêrekî nesaxe.hemü yên li hîvîya biryarekê..
Birîyar ji tuxîbê berjewendîya dernakevit..
Welat ava bû..gund ava bûn..ala bilind bûn..
parçên zevîya li ser banê heîvê hatin kirîn û firotin ..
Mêvanên kelha nizarkê yên duhî û yên evro,hatin ji bîr kirin!**

29/4/2 00 4 nürnbêrg

Dengê bûnê ji qamşlo

Dîyarî bo şehîdên serhildana qamşlo

**Citerxwînî pênek li wî helanê li ser sîngê xwe da û rabû ser
xwe..**

Bêhna xwînê û ya barotê tijî difna wî bûn.

Qêryên wê jina li ber biçûk bûnê.mejyê wî di hêran.

**Dest da çirayekî ron ü türkê pertukên xwe û beref qamşlo, li
tana wî dengî da rê.**

hu, hu, hu kîne em..

emin, em kurdin...

Li sê ryêanekê, Usman sebirî, li pêşiya wî rawestyay bû. dengê wî hêşta yê aza bû ..

jin û zarokên ku bi hîvî hatbûn kuştin

Li ezmanê hevtan carê wan, hê jî dikalin

Duza tula xwe davêjin sernavmlê xurtan

Bi qîr dibêjin demaweye, hûn ne mindalin

Destê stemê tirs ü mirin li welêt barandin

Kes nema ku bêje qelsî bese, zenda vemalin..

Milên xwe dan hev û beref cihê dengî çûn..

Dengê wan bi ser dengê wê jinê diket, lê caran nalîna birîndaran dengê wan mit dikir.

Dengê, haco axay, digel çekdarên wî ‘hemü bê deng kirin:

- Rawestin..xwe li me bigirin..em jî hevalên rêya wene.

Birnoyên wan li ser milan bûn, bêhna azadyê ji rêvçûna wan dihat.

Dengê tembura, mihemed şîxo, bi ser dengê şufînstê zal bibû.

eî felek bo te dinalim, çima nêrgiz çirmisîn?

ew çima bextê me huye ‘em bê dust û bê kesîn?

Seiyd yüsif, bersiva wî dida:

hey felek ji bo çi te ez hiştim ji hevala

emrê min çardeye,xuya dikê mîna kala

Carekê bitinê Mirada min,weî felekê te bi cih ne anî

erê ji kul û ji derda ev dilê min her dinale

huy felek, huy felek....

Tembura wî didestada har bibû ...

**Tîrêj ji xeweka giran rabû,milê xwe da milên wan û beref cihe
dentgê dane rê...**

eî bilbilê dilşadî hele wer bike fîxan

Derde me tgirane eî bira birîna me kure..

**Dengê şivan perwer li pişt dîwarên kerb û kînê li mêrdînê bilind
dibû û dikire hewar:**

hewar.. hewar..hewar..

Dîsan li me fermane. .

Carekadin wekû carane..

**Kuma wan bibû xwe pêşandaneka mezin,millet rabû
serxwe,gund û bajêr harbibûn.azadî dixwînê werbibû,**

**mîrceladet li pêşîya wan bû.ji helebê û
efrînê,serêkanyê,endîwerê,û amudê gehştin qamşlo..**

**hêşta barana xwînê dibarî.hêşta agir bi kavle gundave bû,
hêşta nalîna bindesta bû li bakurê mezin,hêşta leşê şêx seîd bi
darê ve bû.qazî li meîdana çarçira yê bitinê bû.**

**Lê xunava azadyê,ji rexê dî yê xabürî.hêza wan didumand..rêya
wan kurt dikir.serxweş di kirin,ala bilind dikirin.**

**Li qamşlo hêşta ew jina liber biçûkê xwe yê nexrî ya di wî halî
da..**

hêşta zîndan di pirin..hêşta azadî û dîmukrasî û aşî tinê peîzin.

hemüyan pêkve siruda eîreqîb xwandin..

21/3/2 .. 4 neviruz, nurnbêrg

Kalu

Dîarî bo giyanê hozanvanê mezin selman kuvilî

Kalê me baran divêt..

Me ji xudê îman divêt..

**Revda biçûka bi kulanê da çune xwar.Li ser milên wan bükeka
ji dar ü pata dirust kirî bû..**

didestên wan da türkên vala bûn...

**hewarên wan guh di simitin...stiranên wan yên awaz şêlî tijî
asmana bibûn..**

*** * ***

**çend rîh spî û maqûlên êketîya nizîserên duhokê.digel êketîya
hunermenda ü hevalên edeb dust..liser cada giştî di kirine
hewar ü kalê ser spî li ser milên wan bû..**

Kalê me derman divêt..

Me ji hewe harîkarî divêt..

hewarên wan gehştine hewlêrê...

Asman simitin ..kanî aviz bûn.. çîya livîn..

**her dengê kalê ser spî dijwar dibû,her hozanên wî har
dibûn.peîvên wî dizan.bîrhatinên taxî kuçera ser
hildidan,daxwaza wî bo serxwe bûnê har dibû..geha dilê wî sist
dibû.**

*** * ***

Li cîhana bê dila,hemü li hîvîya karwanê nütirîn tirumbêla bûn..

**Karwan gehşt,dev beş bun.lê dîsan hindek enî bûne girê.ji ber
bihayê tirumbêla hevalê wî çend hizar dulareka ji ya wî
girantire.**

her êkser dest da telefuna berüka xwe û digel yabanê axvit:

— Bi zütirîn dem bo min bi bihatirîn û nütirîn tirumbêl firê kine
Kurdistanê.

* * *

her dengê biçüka yê bilind dibit.her kulan tarî dibin. her türkê
wan yê vala ye.her toz ya ji bin piya radibit.

ne kesê dergeh lê vekir ü nebaran barî.

* * *

gewrîya kalî serspî hişik bû.edîb û hunermend westyan.hozan
şêt bûn.peîv peqîn.dil rawestyâ.

* * *

her diwan rojanda,tirumbêleka pir biha gehşte ber derê
malê.hêşta ya berî wê kes lê siwar nebûye.

* * *

Biçûk digirîya xwe da dixew çûn..ü ji birsa di veciniqîn.

* * *

Kalu, li ser cihê xwe hozanek divehand.demê îzraylê bê dil
silav kirye dilê wî .

hozan hêşta ya li bin balîfkê wî dizêt...

peîvên wê yên ciwan neşîyan berevanyê ji dilê wî bikin. çi jê
nehatin, çi mêranî ji kesê ne hat,gyanê wî bi çend dulareka
bikirit!

Li meîdanka eînyê,sê çar careka îzraylî kire hewar:

- Kî dê gyanê vî hozanzanî kirit?**
- Kî dê dilê wî bi çend dulareka kirit?**
- Kî ev mirove divet beramberî çend dulareka?**

Lê bazar ya gerim bû,dular yê bi biha bu,dem dibezî, hêleşuka jîyanê har bibû.her wekû berxekî gurî.kesê çi pê neda.

hozanên wî bûne agir.peîvên wî bûne bizot.

Lê demê dilê wî rawestîyay..hemü tişt bûne xewin.

hîştta şerê bi bihatirîn tirumbêl û ciwantirîn xanî. berdewame ü her yê di şaryêt.

19/2/2 .. 4 nurnbêrg

Min dît

- 1 -

eve gelek cara min dît,hevala jî digut..

ew bû, erê erê ew bû,li nîva bajêrî zembîlkên gilêşî têkve didan.

Li ber dîwarê wê dêra mezin yê nivstî bû.

gelek cara tirumbêla bo hwrin lê didan.

gelek cara polîsa milên wî digirtin.

ew bû ..ez wî baş dinîyasim.

*** * ***

ew bû .. ava xabürî dirawestand..

ew bû..çîya li bin pîya di lerizîn..

erê ew bû..me hemüya navê wî li ser biçûkîn xwe kirin.

ez wî baş dinyasim.

*** * ***

erê ,erê ew bû..

ji birsa mir..ji tirsas mir..ji serma mir..ji xerîbîya mir.

ew bû ..kelexê wî bê xudan bin ax kirin.

ew bû çi nav li ser gurê wî ne hatin nivêsin .

ew bû min bi çavên xwe gurê wî dît!

- 2 -

Navê wî..emê guzê.

Şulê wê.. çeper şkên.

Bejna wî..xeîzeran.

paxla wî..tijî zêrumercan.

* * *

Navê wî..byanî.

Şulê wî..gerok.

Bejna wî..kuvlik.

paxla wî..tijî derman û hepik.

vexwarnê wî..meî û vutka.

Tütina wî..tuza spî!

* * *

Navê wî berze bû..

Şulê wî, nema..

Bejna wî, xwar bû..

eve deh rojin çî ne xwarye.

paxla wî, vala ye.

Welatê wî,ne dîyare.

Bê kes ü kare.

Bi van çava min dît,demê bin ax kirîn.

- 3 -

emê guzê,mahîna xwe firot.

Fîşek ü rextê xwe kirine dîyarî.

Şel û şepkên xwe dane şivanekî rwîs.

Kalik ü gurên xwe dane gavanê gundî.

Tijî paxla wî hîvîne.

Uxer kire xerîbyê!

*** * ***

Min bi çavên xwe dît yê serxoş bû.

hevala digut nedîyare. yê girtîye.mêvanê polîsa ye.

Min dît ji hevala di revî. .

Welatê xwe ji bîrkirye.

Biçûkên wî sêwîne..

gelek cara min yê dîtî,

Tijî rexên wî zerîne..

Lê eve demeke,min ne dîtîye.

- 4 -

Min gelek romanên wî xwandîne..hazan jî di nivêsin.

Awaz daner bû,birastî nivîskar bû

erê..ew bû

* * *

Min dît,ew bû

heta berî sipêdê yê ser xoş bû ..

ew bû li ser cada û dinav kabîna telefonê da di nivist.

ew bû min dît.mala wî pirsîyara wî dikirin.

Welatê wî jê xerîb bibû,

Xame ü kaxez bu wî digiryan.

Rojname ü pertuk le ditgerîyan.

Kesê nedît.

Min dît..demê xerîbyê pêveday û jehra wê dil lê sotî..

Min dît demê bin ax kirî!

-5 -

Kiç çû..

Kur nedîyare..

jin cudaye..

Şul nemaye..

Welat ne li bîre..

hîvî berze bûn..

paşeroj reşe..

Man mirine..

Zivirîn xwe kuştine!

*** * ***

ez nizanim çi bikim?

gazinda xwe bu kê bêjim?

hewara xwe bigehînime kê?

**ez bi bawerim kesê ez nedîtîm. demê wek befira deştê
dihelîyam.**

lewra şopa şêtatîya min hêşta yaxurte.

lewra kes li ser kelexê min ne girî û kesê tazîya min ne gêra.

lewra kesê nedît demê ez bin ax kirîm!

2/2/2 .. 4 nürnbêrg

hebû ..nebû

- 1 -

hebû..nebû

Li welatekî pir av û çîya..

Li welatekî hemü gul û gîya..

ji ber pestalên dagîrkera,seîrançîya çi cih nebû.

Xudanên warî,kurên gundî,li nav dilê welatê xweda çi war
nebû.kirêdarên xanyên xwe bûn..palên dujminên xwe
bûn..cutîyarên zevyên xwe bûn.lewra paşeroj ya berze bu!

- 2 -

hebû..nebû

Welatek çar parçe bû..

Azadî lê peîda nebû..

Dîmukrasî peîvek qedexe bû..

Aştî xewnek sade bû..

Xwandin û zanîn di yasaya wan da nebû..

Xebat tiryake..

Hakim zuhake!

- 3 -

hebû..nebû

Li welatê me peyvek hebû..

Navê peyvê ji (derve) bû..

herkesê zevyek hebû..

parçek zêrî hebû..

Xencerek zîvî. .

Şel ü şepkên pişt pez hebûn..

Firotin û ew peîv kirî..

Lê ji derve. .ne ya mine.. ü neya te ye!

ji derve xudanên xwe hebûn.

- 4 -

hebû ..nebû

Hecî nebû kurek êkane hebû.

Welat hêla..millet hêla, dayka xwe,babê xwe çyara xwe,
xwandina xwe..beref hîvîya da rê..

Li rêya yonan kete avê û berze bû.

- 5 -

hebû..nebû

Xecê dû kiç hebûn.ji ber zulimê revand bûn..

ji birsa û serma rizgar kirbûn!li welatek xoş û tena binech bibûn..

Fêrî kumputer û muzîkê bibûn.

Li jîyê sinêlyê da têper nebûn.di gêleşuka jîyanê da berze bûn!

- 6 -

hebû..nebû

Li welatê me şoreşek hebû..bo xebatê amade bû..

Li serhldanê li nav me bû..

Li avakirinê mandî nebû..

ez bawerim pêdvî mebû..

hilu xecê..hilu hecî nebû

Dabizivirin ..eva me kirî,ne karê mebû.

- 7 -

hebû ..nebû

Li gundê me,min yarek hebû..ya esmer ü dav belek bû.. didilê meda kumek hîvîyan hebûn..

Azadî û pêkve jîyan

Welat ü ala û vîany

hemü li pişt tuxîba min hêlan .

Li xerîbîya, Mam bê xudan..

yarê şü kir..gund ji bîrkir..welat nema umêda min ..

hîvî mirin.. armanc neman!

hebû ..nebû

Min jîyanek xoş hebû..

Min kes ü kar hebûn..

Min pare û mal hebûn..

hemü li rêya ewropa li min berze bûn.

Cejin û xwîn

- 1 -

**hemü di serxoşin, meya azadyê vexwarîne.bêy ageh ji xwe
hebin.li ber mezîqa dîmukrasyê dileyzin.**

aştyê çavên wan nivand bûn.

lewra ketin tura xwînê!

- 2 -

Kebara melayê mizgeftê,digel zenga dêra têkel bibûn.

Kiç û kura kulan tijî kirbûn.biçûka paxlên xwe ji dîyarî ü şirînahîya tijî kirbûn.

Cejne..lê burîne..evîndar bi hîvîne..

hemü şyan ji bo azadyê li karin..

Dîmukrasî biçükekê nazdare..

Aştî meîyeka hare..

hemü di serxoşin..

lewra ketin tura xwînê!

- 3 -

Avedan û tenahî,

Desthelat û tevay, nêzîk bûna hîvîya,

perleman û wezaret,ala ü hukmet..

çav li dil reşa kurkirin.guh lê simitin.mejî lê har kirin.

çi jê nehatin,tinê xwe kirine jehr û barut .

Bi agirê kîna xwe gelek hejar jî sotin.

Û gutin, cejna we ne pîroz!

- 4 -

çik çika demjmêrê,lez li yekbûnê dikir.

Dengê daykên şehîdan bi ser xwekujyê zal bibû.

hestyê şkestî carekadî kuşit girt bû.

Dil ji kerbê zelal bibûn.

dest bibûn êk,mil bi mil ala bilind dikirin.

Nexşa xewinên qazî û pîranî ,li ser mêza wan bû.

çik çika demjmêra azadyê guh li dil reşa simtin.

Lewra xwe kirine agir û jehr!

Û cejna me sor kirin!

- 5 -

pirsyara paşerojê dikin..

Maf û desthelata dîyar dikin..

Nexşew tuxwîba aşkira dikin..

Dad û destura amade dikin..

Ala netewy bilind dikin..

Daxwaza milletî fîdiralîye..

Dil reş jê nerazîye..

Lewra bû şerê ronahî û taryê.

*** * ***

Bi hilmeka azadyê serxoş dibin..

Bi fireka aştiyê di xew diçin..

Li ber fîtkeka dîmukrasyê di leîyzin..

her zû xwe ji bîr dikin..

Didanên xwe nîşa dujmna didin..

Lewra roja cejnê dixwîne werbûn..

Ma em nizanin şoreş berdegame!

Hulako

**hulako yê ji kevluzankê xwe derketî. yê bûye dirindekê
sava.par para wîye. lêvên wî dilerizin.. çavên wî di zilqutin..tlên
desta wek daralînkê xwe têk di husîn!**

- Te bu çi bexda sot?

Da bi agirê kitêbxana(mistensirye)xwe gerim bikim.

- Te bu çi xelîfe kuşt?

- Da caryên wî bu min bi mînin.

Berê wî kete wan dîwara,wênê xwe hlawîstî nedît.

çi çekdara xwe bu ne di çemand. çi zerî û perya tilîlî bu ve ne didan.

Serê xwe şor kir,hizira bire rojên desthelatî.

- ez her hulakoyê caranim ..ez her xudanê hemü birîyaranim.

hün bi çi maf van pirsîyara ji min dikin?

Lê zanî dengê wî ew gurî û barut jê na êt.ewa hizar gund pê sotîn.

Zanê,ew guh nemayne,wan tîra qebül bikin.

Dîsan bî par par û hîvîyên wî .

Lê pirsîyar didestên dadwerî da har bibûn.

- Te bu çi rübar hşik kirin?

- Da masî erzan bibin.

- te bu çi cîran ji xew hşîyar kirin?

- da bêne guvenda min.

- Te bu çi kurd enfal kirin?

- enfal ayateka pîroze.

- Te gund û bajêr û şînkatî û gyanewer hemü sotin ..

çi nema te nekirî .

- Belê, gelek tişt min li ber bûn bikim û ez ne gehştim.
- Wek çi?
- bibim xuda!
- Te nêr xesandin ..mê dutin ..zana berzekirin..zanîn kire tirîyak.
- Nabit kes ji min pitir bi zanit,nabit bejna kesê ji ya min bilind tir bit!
- U helebçe?Te helebçe bi agirê sîyanîdê sot.ji bu çi?
- helebçe ?!Min jî tişteke we sa guh lê buye.

124 .. 2-7- nürnberg

Xanî şahde

Sipêdê,hêšta perên rojê di zer.

Li beramber peîkerê xanî li hîvîya hevalan rawestyam. Silaveka bilez lêkir.bersiva min daw gut:

- ger me hebyaye îtîfaqek...

Bişkurîm,min zanî merema wî çiyê.

Fîr fîra polîsê hatuduyê suhbeta me birî.

ptir ji dû polîsên zêrevanyê rengê cadê şêlandin.

- erê bu vê berê pisêdê van tulaza mal û jin û biçûkên xwe di xew da hêlayne û li ser vê cadê zêrevanyê dikin?!

Berî bersiva min bête dan.dengê rawestîyana tirumbêleka niû û cam reş.rewşa cadê têkda.li cihekî ne dirust rawestîya.

Tirumbêl li pişt bûne şîştuk.cade hate girtin.

Wî polîsê xew digel may.tirsa tirumbêleka (tî ên tî) kirî. DiGel tirsa kirêya girana li ser milî têkel bûn.

paşeroja geşa welatê wî li pêş çava şêlî kir..

Lê hîvî û berxwedan azirandin.

Bi renekî berpirsîyarane.daxwaza cade vekirinê kir.

Lê şufêrî xwe ji yasayê mezntir didît.xew ji bersirsyaryê bihêztir didît.

Li polîsî xwerî û pistuka wî girt û li pêş çavên min û xanî kirêt kir.

ez ture bûm,xanî girî û careka dî gut:

-ger me hebyaye îtîfaqek...

Min neşya xwe û hozana wî bi dawî îna û gut:

- heta em bimirin dê bu turk û ereb û ecema kin xulamî..

Demance

Enya wî wek zevyeka kêlay xweya kir. çavên wî, barana xwîne
jê barî.

Müyên leşê wî wek pîstê jüzî tîj bûn.

Bû dîklê şerkerê qerçeî.

Bi herdû desta pistukê hevdjê xwe girt û bi kulim û mista
seruçav lê xwînelu kirin.

lê agirê kerb û kîna wî hêşta li ser hest ü demarên wî zal bû.

Divîya vê yarya xwînewî bi dawî bînit.

Divîya derûnê xwe têt bikit û çend gulleka gorî serê hevdijê
xwe bikit.

Dest da ber şütka xwe. da demanca xwe ya çardexor li serê wî
vala bikit... Dengê mezîka bithovin ji mubayla wî bilind
bû... helo... helo,,,